



**Efrîn di bin dagîrkeriyê de (131):**

**Binpêkirinên li Bajeroka "Reco", girtinên bê sûcane, "Elemşat" û piroseyên sipîkirina diravan, fewdalîzim û serberdayetî û pakrewanbûna hemwelatîyekî Kurd**



مجموعة صور نشرتها وكالة الأناضول إبان احتلال بلدة راجو- عفرين مباشرة، تبين جزء من الدمار، وكيفية استيلاء الميليشيات على محلات ومنازل بالكتابة على أبوابها.

"الشرطة المدنية" أمام محطة وقود عائلة أوميه في بلدة راجو- عفرين، ومقرها إلى جانب مقر "المحكمة" في مبنى مركز الهاتف ومبنى الزراعة.

جندي تركي يرفع شارة الشبيحة الرضائية بحزامه مبنياً في راجو، ومكتوب عليه بالتركية "بعضين" (أخرى من جرح روما، أما راجو نحن أحرقتها).



مشايير العشيات "المول، المقهى، حجر أسنان مشقى" في بلدة شيه/شيخ الحديد و "نور اردوغان" في ساحة النبعة تحت العلم التركي



سقوط قنائف على مدينة عفرين مساء ٢٠٢١/٢/١٧م

**B**i ser ku Turkiya dagîrker reşantiya ragîhandinê û dorpêçkirinê li ser Herêma Efrînê ferz dike; Ew bi riya alavên ragîhandinê yên pêve girêdayî û bi ser ve yan jî bi riya şand û nûnerên alav û rêxistinên cîhanî re, bi her awî hewil dide ku wêne û rûyê xwe yê reş ji binpêkirin û tewanên li Efrînê pêk tîn û guhertina demografi ya rêbazkirî ku têde çêdibe, cîlaw û xweşik bike; Û nimûneya herî balkêş Gotara "Karlota Gal" Kargêra Nivîsgeha Rojnama "Niyoyork Timz" li Istanbulê ye, ya ku li /16/Reşmeha em te de hatiye belavkirin û dayî xuyakirin ku "Efrîn herêmeke aram e û Sûrî tê de bi hebûna Tirkîyê şa ne" û herweha jî çavan ji wan qirêjîyên ku ji ber dagîrkeriya Tirkîyê gihîştine Nişteciyên Efrînê yê resen dadimrîne. Vaye emê hinek ji wan binpêkirin û tewan hewaldin:

**=Bajeroka "Reco" - navenda navçê:**

Li Bakur Rojavayê Bajare Efrînê bi /35/KM an, berî Sînorê Tirkîyê bi dora /3/KM an, û li orta cîgeheke çiyayî dikeve; Dora /45/rojan bi qehremanî li hember dijmin li ber xwe da, bi hemî cûreyên çekan hate bombebarankirin, /6/avahî -

heryek bi çar taqan, /20/ mal, avahiya dibistana kevin, û avahiya asayîşê "ya kevin û ji dema Firensiyen ve hatibû avakirin û weke zanîwarekê tê nasîn", bi tevayî hatin wêrankirin. Herweha jî, çar guvêşgehên zeytûnan ên van hemwelatîyan (dilovanber Hec Reşîd Reşîd - derbasgeha Riya Etmana, zaroyên Osmanî Mihik - Riya Maseka, Şukrî Omê - Riya Memala, "Se'îd Omê û Dr. Ezîz Bakîr" - nêzîk gir û derbasgeha bajêr) tevî dizîna alavên di bin kavilan de û hesinê avahiya wan, hatin xerakirin. Nanpêjgeha otomatîk ya "Elî Kenco" û dora /50/ malî jî bibeşekî hatin roxandin. Çar cîgehên xalên bijîşkiyê di dema şer de hatin aramanckirin. Û kevir û mermerên tirbeyên goristana Reco jî hatin wêrankirin û dizîn. Weha jî li dema êrişkeriyê, milîseyan kelûpelên hundir piraniya mal û dîkanan ji şênberên xwarin û vexwarinê de bigir ta zêta zeytûna, alavên malane, raxistok, amûrên elektirîka roniyê û firaxên baqirî, dizîn. Paşê jî, hemî tiştên di malên ku dest danîne ser de, û herweha jî, di dû re kebil û têt û stûn û guhêztok û amûrên toreyên elektirîkê û telîfona zemînî yên giştî, bi dehan makîne û tirektorên çandiniyê, û tevahiya amûrên herdu stasyonên ava vexwarinê yên didin bajarokê û hin gundên wê ( ya yekê li nêzîkî Gundê "Qere Baba" û ya dudiyê jî li Kaşê "Armûtê"), yên ku paşê ji nûve hatin amedekirin û sazkin. Bi ser de jî, bi hezaran darên zeytûnê, behîv, hejîr, gûz û ihracê yên li derdora bajarokê hatin qutkin.

Bजारok ji dora /1500/mal pêk tê, jê tenê /400/malbat tede man, û dora /1500/malbat ji anîndeyan tede hatin niştecîkin, ji bilî yên di kampa ku li nêzîkî stasyona tirênê ya hevçîwar hatiye avakirin de.

Milîseyên "Ehrrar Elşerqiyê - ya tede herî bi bandor, Elfirqe Eltasî'e, Ehfad Elresûl, Lîwa'i Elşemal" bajarokê desteser dikin, û malmewalên giştîyane û taybet ên ku desteserkirine, ev in:

-/1100/mal û 80% ji dîkanan a ku digihêje dora /200/dîkan, ji aliyê hemî cûreyên milîseyan ve, hatin desteserkirin.

-Bêtirî /100/hezar darên zeytûnê û hezaran darên meywan û zeviyên çandiniyê li derdor bajarokê û hin gundên wê û vedigerin hemwelatîyên bi zorê hatine koçberkin, ji aliyê cûrbecûr milîseyan ve hatin destesekirin.

-Bi zorê "Elşerqiyê" di karanîna herdu nanpêjgehên otomatîk (nanpêjgeha Elî Kenco ya hatiye nûkin, û ya zaroyên Binefşê) û stasyona sûtemeniyê ya "Omer Şerîf" li bajarokê de, bû hevpar (Ortaq).

-Guvêşgeha zeytûna ya hemwelatî "Mûradî Omê" - li ser riya Gundê "Memala" -bi ser ku, xwediyê wê li Reco ye -, ji aliyê "Elşerqiyê" ve tê bikaranîn.

-Guvêşgeha zeytûna ya dilovanber "Memdûh Omê" - Derbasgeha Reco - bi ser ku hevçîna rehetî li Reco ye -, ji aliyê "Elşerqiyê" ve tê bikaranîn.

-Guvêşgeha hemwelatî "Hesen Ebdo Kûrê" yê koçberbûyî - nîzîkî kevana derbasgeha Reco, ji aliyê "Elşerqiyê" ve (ya ku dest daniye ser malê jî û ji xwe re kiriye biryargeh û zîndan),tê bikaranîn.

-Istasyona sûtemeniyê ya malbata "Omê" li destpêka bajarokê, ji aliyê "Elşerqiyê" ve ( ya ku dest daniye ser mala malbatê û ji desteya aborî ya xwe re kiriye biryargeh ), tê bikaranîn.

" -Elşerqiyê" geraca makînan guhestiye bazara kirîn û firotina hemî berhemdayînên çandiniyê û şênberên xwarinê, û rê nade kirînkar û firoşkaran berê xwe bidin Bajarê Efrînê, da ku, li wir bazara xwe bikin.

-Artêş û Istîxbaratên Tirkiyê, avahiya dibistana amedeyî û navîn ji xwe re kirine biryargeh.

-Mala herdu hemwelatîyên bira "Mihemed û Hemo Mihik" kirine biryargeh ji Dadgeha Leşkerî re.

-Avahiya "Navenda Telîfona Zemînî" ji "Asayîşa Sivîlî" re kirine biryargeh.

-Avahiya "Çandiniyê" ji "Niyaba Giştî û Dadgehê Lihevhatinê" re kirine biryargeh.

-Avahiya asayîşê û avahiya kompaniya elektirîkê yên berê, ji "Asayîşa Leşkerî" re, kirine du biryargeh.

-Malên hin sivîlan ji milîseyên "Firqit Eltasî'e, Ehfad Elresûl û Lîwa'i Elşemal" re, kirine biryargeh.

-Girov û toreyên zayendina elektirîkê yên taybet bi Ampêran, ji aliyê "Elşerqiyê" ve tèn bikaranin.

Û niha jî ji bilî avahiyekê ji bo dibistana amedeyî û seretayî nemayî, û dibistana navîn (ya ku, ji bêtirî /35/salan ve hatibû avakirin) ji holê hate rakirin.

Û xelkê bajarokê tûşî hemî cûreyên binpêkin û tewanin din jî hatin, ji kuştin û koçberkin û girtinên bêşûcane de bigir, û ta îşkencekirinê, danûstandina bêrûmetkirinî û hişk, ferzkirina vêrgî û baceyên diravî, dizînê û hin din. Hema li vê dawiyê, dema ku hemwelatîya jinebî "Diya Samêr" rojeke tenê ji mala xwe bi dûr ket, hin tiştmiştên wê hatin dizîn.

Divê were bi bîranîn jî ku, milîseyan bi hevaltiya Istîxbaratên Tirkiyê, li navîna sala 2018an ev hemwelatî (Reşîd Ebdo kurê Mistefê û Sultanê, Ferîd Mistefa kurê Ehmed û Mewlîdê, Mihemed Mile Elî kurê Ednên) ji xelkê Reco girtin, bêyî ku pêşkêşî dadgehkirinê bibin, ew bi zorê veşartin, û ta niha çarenûsa wan ne diyar e.

#### **=Girtinên bêşûcane:**

-Li destpêka vê Reşmehê, destlatên dagîrker hemwelatî "Mihemed Hemo kurê Umer û Sewliyê" ji xelkê Gundê "Kumreşê" - Reco - piştî girtina wî li 19.3.2018an, ji aliyê milîseyan ve û bi hevalkariya Istîxbaratên Tirkiyê û xistina hepsa "Meydan Ekbezê" li destpêkê, paşê wendakirina wî ji ber çavan bêtirî du sal û nîvan, û li dawiyê guhestina wî bo Hepsa Maratê li Efrînê -, serbest hate berdan.

-Li 14.2.2021an, milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah - Elemşat" ev hemwelatî "Ebdo Tane kurê Henên, Arêf Dilo kurê Reşîd, Mihemed Şêx Henan Kurê Mistefê, Welîd Miho kurê Mihemed" ji xelkê Gundê "Hêkiçê" - Navça Cindirêsê, li dema ku ji Gundê "Qermîliq"- Navça Şiyê ji karê kesaxiya zeytûnan vedigeriya mal, bi behaneya ku ew revînkariyê li ser sînor dikin, girtin û îşkence kirin û du qurşîn li lingê ciwan "Ebdo Tane" xistin, û piştî sê rojan ji libaxwehiştinê û lêkolînan, ew berdan.

### = "Elemşat" û pirojeyên sipîkirina diravan:

Weke sipîkirin ji diravên xwe yê ne rewê re, nixumandin ji tewanên xwe re, û rewayetî ji hebûna xwe re; Li 17.2.2021an, milîseyên "Firqit Elsultan Silêman Şah" û serkêşê wê "Mihemed Elcasêm - Ebû Emşe", bi beşdariya "Nesir Elherîrî (serokê Kiwalisyona Sûrî- Ixwanî)" û "Selîm Idrîs (şalyarê bergiriyê yê Hikometa Kiwalisyone ya Demkî), di nav zeviyeke zeytûna ye Malbata Silêman "Soff" de (ye ku li derbasgeha bajarokê û piştî kevanê li aliyê rastî rêkê dikeve), "kevîrê bingehîn a avahiya nexweşaneyekê li Bajaroka Şiyê danîn, û bêyî ku mafê zeviyê bidin malbatê; Herweha qehwexanak bi navê gergeha "Receb Teyêb Erdoxan", li orta "Meydana Kaniyê", li ser dikanên ku dest danîne ser, bi beşdariya berpirsiyarekî Tirk û cendirman, vekirin; Û bazarxaneyek(mol) li nav dikanên ku dest danîne ser ên van hemwelatîyan ( Nezmî Şêxo û Mihemed Ibrahîm) li nêzîkî sûtmengeha "Goçer", bi beşdariya berpirsiyarekî Tirk û cendirman, vekirin. Bi ser wê de, gelek pirojeyên din li Efrînê û Tirkîyê jî, bi diravên ku bi dizîne û malmewalên talanê çî yê giştîyan yan taybet hatine komkirin, û bace û vêrgiyên li ser xelkê navçê û gundên wê yê di bin destan de hatine ferzîkirin, û bi mûçe û yadîgariyên ku ji ber nandoziya wî ji Tirkîyê re - çî li Lîbiya yan Ezerbeycanê -, hatine vekirin.

Serveşartina Tirkîyê û Kiwalisyone ji pirojeyên "Ebo Emşe" re (yê ku bi hemî şewan malmewalên pir talan dike) bi xwe tewankariyek e, û bi binpêkirin û tewanên ku ew û milîseyên wî dikin re hevpariyek e.

### =Fewdalîzim û seberdayetî:

-Li 14.2.2021 an, pevçûnina di navêna milîseyên "Ehrrar Elşerqiyê û Ceyş Elşerqiyê" de, li Taxa Rif'etiyê - Bajarê Cindirêsê, rûdan. Û li derbasgeha bajêr li pêş dîkana hemwelatî "Ebdo Mehmûd" teqînek çêbû, di encamê de, du kes birîndar bûn û ziyarin şênberî çêbûn. Û li roja din, temenmezîna birîndar "Ezet Xelîl Osman" - ji xelkê "Çeqelê Ortê û li Cindirêsê rûdine", ji ber birîna xwe şehîd ket.

-Li 16.2.2021an, "Ebo Şiblî" (serkêşekî milîseyên "Feyleq Elşam" li Bajarê Cindirêsê) li orta Kolana pêşesaxaneyan, bi awakî mekin li Bijîşk "Ehmed Silêman - ji xelkê Gundê Gewrika" xist û sixêf jê re dan. Lê, hevkarîya wî bi destlatên dagîrker re, û dostaniya wî bi Istîxbaratên Tirkîyê û hin milîseyan re, tu fêde lê nekirin.

-Li êvara 16.2.2021an, li Taxa Mehmûdiyê, makînak cîp bi bombeyeke teqîner hate teqandin, û di encamê de, kesek birîndar bû û ziyarin şênberî çêbûn.

-Li 17.2.2021an, Herêmên Şehba'i (Çadirgeha Serdemê, Gundên Til Qirahê, Kîştî'arê, Ibînê...) yê tijî koçberên Efrînê, bi çend avêjtekên ji aliyê Artêşa Tirkîyê û nandozên wê ve, hatin armanckirin.

-Li 17.2.2021an bi şev, çend mûşek bi ser Bajarê Efrînê de hatin, li hin avahiyên çarkoşeya ewlehiyê li dor Nexweşxana "Avrîn" a berê ketin, ziyarin şênberî û bêtirî deh birîndaran encam dan, û tirsek mezîna di nav nişteciyan de çêkirin.

Di çarçewa belavkirina çanda olî - Osmanî û Ixwanî de, li 17.2.2021an û di bin serpereştîya "Mala Fetwedan û Seknê û warên olî li Efrînê" de, "Nivîsgeha Belavkirina Olî" ya li bajêr, ji bo serkeftin û rûmetkirin û xelatkirina hejmarek xwendekarên ku "korsek giştî di zanista jêmayînan (mewarîs) de" bi dawî kirine û li ser herçar bineolên Islamî yan li ser yekê ji wan rêdan wergirtine, ahengek li dar xist .

Ma Berêza "Karlota Gal" di seredana xwe ji Efrînê re, darên zeytûnê yê qutkirî, dibistanên bûne biryargehên leşkerî, nişteciyên bajêr ên Kurd û berê 95% û niha bûne 20%, firoşxane û malmewalên ji xwediyan standine û dest danîne ser, çawa navên dibistan û meydanan ji Kurdî bûne Turkî û Erebî, tunebûna Peykera "Kawayê Hesinkar" (simbola kurdî ya navdar), nedîtî?...Tu carî mirovê bi wijdan nikane çavan ji tiştên ku li Efrîna dagîrkirî bûne û hîn jî dibin, damirîne.

21.02.2021an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

### Wêne:

- Giropek wêneyên ku Ajansa Anadolê yekser di dema dagîrkirina Bajaroka Reco de belavkirine, yê ku beşekî ji wêrankirinê û çawabûna deteserkirina milîseyan ji firoşxane û malan re û nivîsandina li ser deriyên, diyar dikin.

- "Asayîşa sivîlî" li pêş stasyona sûtemeniyê ya Malbata "Omê" û biryargeha wê ya li rex biryargeha "dadgehê."

- Leşkerekî Tirk nîşana "Gurên Beresorî" li rex avahiyekê li "Reco" hildide, û li ser bi Turkî bi vê wateyê hatiye nivîsandin "ez nizamim kê Roma şewitand, lê Reco me şewitand."

- Pirojeyên Elemşat " bazarxane (mol), qehwexane, kevrebinyata nexweşxanê" li Bajaroka Şiyê û "Gergeha Erdoxan" li "Meydana Kaniyê", di bin Ala Tirkîyê de.

- Pakrewanê temenmezîna "Ezet Xelîl Osman."

- Şopa avêjtekên hatine Bajarê Efrînê.

- Xelatkirina xwendekarên ku rêdanên ol û bineolên Islamî wergirtine.